# Belgegeha Zniyarîyan

## Bernameya "Perspektive Aufstieg" (PPA) Semestera havînê 2025

**Dema serîlêdanê:** 25.11.2024 heta 24.01.2025

**Bername ji sê Beşên sereke pêk tê:**

1. **Gavên Ziman:**
    - B1, B2, C1

2. **Beşên Peywestekarî** (Glückauf!)

    - Semînerên cihêreng / atolye / gerên rênîşander (mînak atolyeya nivîsgehê, gerên rêberî li Muzexaneya (Bergbau) ya Alman û gelekên din).

3. **Beşên Teknîkî:**

    - ji B2: Beşdariya li hemî Wane / semîner / tutorial ji bo Xwendekarên birêk û pêk.
    - Ezmûnan binvîsin û Destkefteyên xwe bi xwe re bibin dema Xwendina Zanîngehê.

**Têbînî:**

- Tê payîn ku Kursên almanî di **31.03.2025** de dest pê bikin.
- Her kursê her hefte 15 wane tên dayîn.
- Demjimêr ji bo her kursê cûda ye. Hûn ê sê hefteyan berî destpêka Kursê li Astan werin belavkirin.
- Bilêtên Zanîngehî / NRW li her sêmster dora 250 Euro. Kursên Almanî belaş in.
- Ji B2-de dibe, ku PPA Qelenê Ezmûnên Ziman yên fermî (DSH / Telc C1 Hochschule / TestDaF / C1 Goethe) seza bike.

**Daxwazên ji bo mirov karibe beşdarî Bernamê bibe:**

- Xwendekarên biyanî yên ku dixwazin bi statûya penaberiyê yan bê penaberiyê
- bixwîninBawernameya ketina Zanîngehê(Abitur) ji Welatê biyanî, ya ku li wêde ji ber Zanîngehê dêrandî be.
- Armanc ew be, ku tu li Zanîngeha Georg Agricola Xwendina xwe bidawî bike.
- Beşdarbûn li Ezmûna diyarkirina Astê elmanî ya PPA

**Ez çawa karim xwe tomar bikim?**

Niha ji kerema xwe gavên qeydkirinê bişopînin:

1. Ji kerema xwe belgeyên jêrîn Wek (PDF-Datei) ji bo Bewerbung-ppa@thga.de bişînin:

- Bewernameya Bekelorya: Rûnivîsek rengîn ji Rûnivîsa resen
- Bewernameya Bekelorya: Rûnivîsek rengîn ku bi elmanî hatibe wergerandin
- Rûnivîsek rengîn ji Destûra rûniştinê (Îqame)
- Wêne
- Ravêja bîrdarî (C.V)
- Rûnivîsên rengîn ji Belgeyên Zanistî heger hebin
- Rûnivîsek ji Bawernameya Ziman

2. Em ê Belgeyên we kontrol bikin.

3. Dema ku Belgeyên we temam bin û hûn Daxwazan bicî bînin, em ê ji we re Sozdanekî di riya E-mail re bişînin.

4. Piştî Qeydkirina te, tê ji bo Ezmûna diyarkirina Astê li Thga werê vexwastin. Wê Asta te were diyarkirin û gorî wê tê beşdarî Bernameya me bibe.

5. Dema ku we Encama Ezmûna diyarkirina Asta xwe ya elmanî wegirt, winê karibin biryar bidin, ku hûn ê cihê xwe di Bernameyê de bigirin yan na.

**Heger Pirsên we hebin, ji kerema xwe bi riya Telîfonê yan jî E-mail re Têkiliyê bi me re bikin.**

Isra Struzyna
E-Mail: Isra.Struzyna@thga.de
Tel.: 0234/968-3215